

Ji helbestvanê Suryaniyan Yusuf Dikmen pirtûkek nû: 'Navê hesretê welat bû'

Nirxandin û danasîn: Gabar Çiyan

Bêrîkirin, hîsek însanî ye. Hesreta evîndaran dihêne zimên. Dema hesret berê xwe li welat be û jiyana mirov li sirgonê derbas bibe, dibe mîna pizotên agir û hinavê mirovî diperitîne. Hesret laşê mirov radipêçe û janê dide rûhê mirovî. Hezkirin û girêdana evîne kurtir û agirê dilê mirovî gurtir dibe. Bilind dibe, dibe evîna MemûZîn ê, pîroz dibe rengê dêra Mor Gabrîel û Lalişê distîne...

Ez qala gelê Suryanî dikim. Ji ber nasname û ola xwe hatin sucdarîkirin. Sucekî wan hebû, lê herdem ji bo sucekî du (2) caran hatin cezekirin. Lewma êşa wan ya sirgonkirin, girtin, kûştin û qirkirinê pir giran e. Jiyana li sirgonê birayê mirinê ye, asîmîlasyona rojane rêya windabûn û tunebûnê ye. Lewma evîna welat ne hêsan e bibe helbest û êşa xelkê bihêne zimên.

Ez behsa helbestvanekî ji yê welatê xwe dikim. Welatê pir reng,, pir çand, pir ol dikim. Helbestvanek ji Tora Evdînê, ez qala Yusuf Barsaumo Dikmen dikim. Ez ê hinekî li ser berhema wî ya nû, **'Özlemin adı vatanmış- Navê hesretê welat bû'** kur bibim.

Heft roj in, dixwînim helbestên wî. Yek hefte ye, dibin heval ji min re, li welatê bavûkalan, di nav adet û toreyên sedasalan digirim. Xweza, xweşikbûn û şêraniya bajar, gundan û mirovan min şa dike. Rûpelên reş ji dîroka herêmê dibin kabûs û nivê şevê xewa şêrîn li min dikin jehr, di nava xwedanê de dihêlin, perîşaniyê bi ser mi de dihênin. Carna bi hêviyên mezin, yê yekîtiyê, biratî û wekhevîyê em mil didine hev, bi hev re dimeşin ji bo pêkanîna xewnên xwe, armancên xwe.

Helbesta **"Hesret"** stirana rehmetiyê Aramê Tîgran, "were were keko were/ li welatê xwe vegere" dihêne bîra mirovî. Lê helbest, bi nalîn û qîrîniya dayikekî Suryanî barkirî ye. Banga wê berê xwe dide lawê wê yê li sirgonê:

Êşa laş û piştê zêde bû
porê min sipî
min te mezin kir û jiyaneke feda kir
ji bo ku li ber serê min rûne
min bi tenê nehêle

Tenêbûnê eş e, elem e, jan e
tu îro li xerîbiyê
û ez bi tenê

Ez hatim jibîrkirin
çavê min li rêya te qurimî
li bendan te ye, vegera te ye...

Hûn dara "tu" wê nas dikin, an na?

We tuwên zer û sorereş xwarine, an na? Ji bo êşa dila pir baş e dibêjin, li aliyê me.

Lêvên sor, ji şekir şêrîntir, yê qîzikan û çavxetalên li welatê min, rengên xwe ji wan distînin gelek caran.

Di cejna Mesîhiyên welatê min yê paskalyayê de, bi hêkan re tene kelandin tuwên Torê û hêkên heft rengîn rengê xwe ji wan distînin û tene ber mêvanan, digot rehmetiyê apê me, Yusuf Dursun.

Ez zanim wê Torî aciz bibin, hêrs bibin, lê dîsa jî divê ez bêjim. Ez bêhtir hez dimsa tuwa dikim. Helbet niyeta min, ne biçûkirina dimsa tirî ye. Ez qala dewlemendiya Torê dikim. Tamên cewaz dikim. Huner û dewlemendiya metbexa Torê dikim. Divê hûn dimsa tuwa tam bikin.

We qet tuwên hurkirî di ber “dondurma Gurgum”ê de alastiye? Tecrûbe bikin.

Çaya tuwên hişk kirî, li hemberî serma û zekemê derman e dibêjin, hekîmên welatê min. Divê hûn çend çaya vexwin.

Helbestvan Dikmen ji awirekî din nêzî dara tuwê dibe û wateyekî din li “**Dara tuwê**” siwar dike:

Bi hezaran sal in li ber siya darên tuwê

Di nav xewn û xeyalan de diçin em

Bi sedan xewnên erênî dibînin

Bi çîrok û efsaneyan mezin dibin em

Li ser milê dayikên Aşuriyan

Nanê tenûrê tê bin dara tuwê

Ava hênîk ya kaniyê te ser sifrê

Bîranîn dibûn mijara ber siyê

“**Kerwan**” û helbestên li ser kerwanan beşek ji çanda herêmê ye. Kelemên li pêşiya kerwanan herdem hatiye zimên û bûye mijara helbestan, helbestvanan. Helbestvan li gorî çand û adetê herêmê, ji bo qencî û buyerên neyênî navgînan peyde dike, bi hêviyên pêşerojê jiyane zindîtir û xweştir dikan, anjî xelkê şiyar dikan, xeteran eşkere dikan. Helbesta kerwan ya Dikmen jî wisa ye:

Dibêjin ku dawiya sebrê heye

raste, an na?

ez pir caran pêrgî mirovan bûm

beşek ji wan bê hêvî

û hejmarek bi hêviyan barkirî bûn

Zext dayîna li ser hêviya

bêsûd e dibêjin gelek kes

ma tu zanê?

Di reşahiya tarî ya şevê de

kerwan dimeşe û kûçîk direyin

dengê sega wînda di tariya şevê de

Û kerwan di rêya xwe de diçe bê rawestan

Ne yek, ne sed, ne jî hezar. Qetilkirina heftê hezar kesan ne hêsan e bikeve ser kaxezê û rengê helbestê bistîne. Buyerên wisa mirov dihejîne, rûhê mirov birîndar dike.

Helbestvan Dikmen qetilkirina 70 hezar kesan ji devê şahida bûyerê, pîrejinek 80 salî distîne û bi navê “**Dîmenek**”î pêşkêş dike:

Ez im şahid

ya qirçirina heftê hezar kesan

serên ji bedena jêkirî

cendek li alîyekî û seriyên di dest wan de

Ji serê gira dihatin xindirandin

serê bê cendek

û cendekên di nav gola xwînê de wundabûyî

Ma ew roj tene jibîrkin, lawê min?!

“**Hizirkirin**” e navê helbestek ji ya Dikmen.

Bela serê mirov e hizirkirin, li welatê me. Dibe sedema girtin, îşkence, kûştin, talankirin û sirgonê. Lê helwestek însanê ye, hizirkirin. Kesê hizir neke nikare bibe alîkarê guhertin û pêşketinê.

Helbestvan bi helwestekî wisa reng dide helbesta xwe:

Hizirkirin ji te re ne pêwîste
gotin min
lê ji roja ez bîr dibim, ez hizir dikim
di rêka hizirkirê de dimeşim ez
rêvî radiwestin, lê ez nawestim
her hizirkirinek rê ji yekî nû re vedike
ne rê dev ji min berdide
ne jî ez dev ji hizirkirinê...

Pirtûk bi zimanê turkî di nav weşanê Arjovî di sala 2009 an de belav bû. Mijara helbestan ji hesreta welat û evîndariyê pêk tê. Pirtûk 160 rûpel e. Kesên bixwazin dikarin bi rêya e-mailê bixwazin: barsaumo@hotmail.com

Me ji Yusuf Dikmen pirs kir ku, **çima navê hesretê welat e?**

“Ez li wir çêbûme û mezin bûme. Zarokbûn û ciwanbûna min li wir reng girtiye. Ez perçeyek ji xaka wir, çiya, erd, kevir, ba, çand û toreyê wir im. Xwezaya wir ez afirandime û reng daye hîsên min. Lewma di helbestên min de xweşiya welêt xwe dide der.

Bi hemu aliyê xwe, rojên xweş û rûpelên reş, bi hezkirin û lehengiyê, welatê min reng dane helbestên min. Her aliyek ji welêt mîna wêneyekî ne. Wêne dikevin ser peyva, peyv dibin helbest û rengê welêt û hesreta welêt distînin. Hêviyên me di wan de hatine bicîkirin. Û pêşeroja me.

Ez ê berdewam bikim û qala welatê xwe bikim. Zarokên me jî dê me fêhm bikin û ji bo hesretê bi dawî bihênin dê bixebitin. Lewma hesreta welat mijarek girîng e û cihê xwe di helbestên min de distîne...”

Yusuf Dikmen kî ye?

Em wî bi navê ‘Barsaumo d’beth Gauro’ nas dikin. Barsaumo ye navê wî yê kurt e. Yusuf hinekî fermî ye. Bi eslê xwe ji Torê, ji gundê Urdnus/Arnas ê ye. 1976 an hetiyê Swêdê.

Di rêxistinên Asurî/Suryaniyan de kar kiriye û bi pirsên civakî daketiye. Ji 1984 an bi Sosyal Demokratên Swêdê re kar dike. 10 salan di Federasyona yekgirtî ya biyaniyan-SIOS de weke nûnerê Asuriyan kar kiriye.

Di gelek kovaran de makaleyên wî belav dibin. Ji bilî xebatên antolojiyê, sê pirtûkên wî derketine.

- *Assur i Exil, 2004 (Swêdî)*
- *Moder assyria, 2005 (Swêdî)*
- *Özlemin adı vatanmış, 2009 (Turkî)*

EuroKurd News/Cîhana Weşana - <http://publishingworld-eurokurdnews.blogspot.com/>